

Dumahîk: Hevbeyvîn...

ji neteweya kurd û birêveberên vê xebatê dikim û bi germî destê wan diguvişim. Pirs: Xelkê Kurdistanê zêdetir dixwazin li ser kesayetiya Dr. Qasimlo bizanin. Gelo riftar û xebata şoreşvaniya Dr. Qasimlo rengvedan li ser jiyana rojane ya şehîdê nemir hebû yan na? Nesrîn Qasimlo: Bêguman, kar û kiryarên Dr. Qasimlo hev digirtin. Ew her bi qise demokrat nebû, ji ber ku bi kiryar jî diselimand ku demokrat e û encamên demokrasiyê jî dipejirand. Wî ji bo modernîzekirina xebata Kurd û PDK'ê, hewleke zaf da. Karîgerî û bandora Qasimlo li ser xebata millî- demokratîk a Kurd li riftar û livîna demokratane û baweriya kûr a wî bi demokrasiyê çavkanî digirt.

Pirs: We sala borî bi hevkarîya komîta PDKÎ serdana Amerîkayê kir û di çendîn civînên girîng di astek bilind de hûn li ser dosya Dr. Qasimlo axivîn. Em dikarin bizanibin ku we çî bersivê stand? Gelo li wê seferê di pêxema dûketina dosyaya Dr. Qasimlo de we çî piştevanî bidest xist?

Nesrîn Qasimlo: Di rastî de li Senaya Amerîkayê, ez gazî kirim. Min ji wan pirs kir ku gelo belgeyên hewce ji bo dubare ve bûna perwendeya Viyenê hene? Çunku dewleta Otrîşê heya niha jî amade nîne di vê derheqê de çî gavekê bavêje. Ew teror zêdetir bûye goriyê dan û standinên bazirganî. Hûn dizanin ku hukûmeta wê demê ya Otrîşê sîlah û çek û cebîlxane bi Îraq û Îranê firotibûn. Di halekê de ku wî welatî weke welatek bêalî di şerê navbera Îran û Îraqê de, mafê vê yekê nebû ku wî karî bike. Lewra pîr ditirsiyan ku di rewşa wê demê de ew tişt êşkere bibe. Lê ez bêguman im ku ew dosya dê bikeve kar û edalet û dadperwerî

jî cîbicî bibe. Ji ber wê jî hin kes hene ku bo cîbicîbûn û birêveçûna edalet û vê dadperweriyê xebat û tekoşînê dimeşînin. Bila ez jî vê yekê bi çavên xwe nebînim, lê eva jî rastiyeke e û heta ser veşartî namîne. Pirs: Xelkê Kurdistanê we bi dayîka Kurdan nas dikin û rêz û hurmetek taybetî ji bo we hene. Peyama we ji bo xelkê di pêvajoya xebata berheq a gelê me de çîye? Nesrîn Qasimlo: Gava ez guhdariya van peyvên dikim, dilê min dihele. Min karek wisa bo Kurdan nekiriye ku hêjayî ew hemû rêz û hurmetê bim. Lê tim dilê min tevî wan û xebata wan e. Ez dizanim ku ew, hêja û jêhatiyê jiyanek serdemiyane ne. Hêviya min ew e ku di domandina xebatê ji bo rizgariyê de berdewam bin û ez bawer im ku hûn dê serkevin. Hêviya min, ev e ku qet rê û rêbaza Qasimlo ber nedin, bona wê ku evîn û hurmeta wan bo xelkê û xaka wan kêmbibe. Kurd divêt bizanin ku ew jêhatî azadî û serbestiyê weke gellek neteweyên din yên vê cîhanê ne. Mafê Kurdan e ku ji bo gihîştin bi jiyanek baştir serbarê hemû çewisandin û tepeseriyekê, xebata rewşa û berheq ya xwe bidomînin. Di vê xebatê de ez tim digel wan de me û serkevtinê ji wan re bi hêvî dixwazim.

Ji malpera PDKÎran**Dumahîk : Kurd Li Sûriyê**

ewlekkarî berdewam e ji bo riftarkirin digel doza Kurdan li Sûriyê, bi rêya cîbicîkirina siyaseta girtinê li hember gelê Kurd û tevgera wî ya siyasî jî ya ku serkirdeyên wê niha bûne armanca desthilatê, wek girtina endamên desteka serkirdayetiya Partiya Azadî (Mistefa Coma, Sedûn Şêxo, Mihemed Daîd Umer) û peyvdarê

Şepela Paşeroja Kurd (Mişel Temo) û çend rêberên dî yên partiyên Kurd li Sûriyê.

Ji Kovara Agirî Hejmar 121